


*Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*

*wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

**Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî**
**Xelek 15**

# Serpêhatiya Rêberê Kurd Abo Muslimê Xurasanî

## (1) Bûyerên Pêş Avakirina Xîlafeta Ebbassî

Pîştî têkçûna *Padîşahiya Madan* li ser destê Farisan sala 550-î b.z. û heya rojên îro serweriya Kurdistan û neteweya Kurd hate şikestin, sînor û payedariya wê li ber her dagîrkerekî vekirî ma. Tenha bi talankirina xêr û bêrên Kurdistanê yên aborî jî nekirin, wan hemû şiyanên leşkerî yên Kurdan jî xistin xizmeta projeyên xwe yên vegirtin û berfirehkirinê. Pir caran jî hin rêberên leşkerî yên Kurd wezîfedarkirin ku serhildan û şoreşên Kurdan vemirînin. Gava ew rêberên Kurd hinekê ji bin fermana serdarên dagîrker derdiketin, sezayên here giran li wan dibirîn.

Di vî warî da serpêhatiya rêberê Kurd *Abo Muslimê Xurasanî* li gel xelîfeyê Abbasî *Abo Cehfer El Mensor* bi rastî gelek balkêşe. Ji heyama Îslama Siyasî, ev nimûneyeke ji sezayê giran ku rêberên Kurd ji dest serdarên Ereb girtin; tevî ewqas bergirî û xizmet di ber wan da. Daku em vê serpêhatiyê bi temamî nasbikin, divêt em vegerin ser heyama destpêka xîlafetê û bi taybetî ser kefteleft û dijberiya li ser wê di nav Ereban da.

### Kefteleft û Dijberiya li ser Xîlafetê:

Hema gava *Pêximber Muhemmed* sala 10-ê goçî/632-yê z. wexer kir û hên berî ku cendekê wî têxin gorê, kefteleft û dijberiya li ser desthilatê di navbera sehabiyeyên mezin da destpêkir. Pir zû hevpeymaneka siyasî - ne fermî pêkhat; di nav wan da sê kesên bi nav û deng cih girtibûn, ku ew jî ev bûn: *Abo Bekir El Siddîq*, *Umer Bin El Xettab* û *Ebo Ubeydeh Amir Bin Cerrah*. Hemû jî ji *Muhacîrînan* bûn (yên ku ji Mekke hatibûn û ew ji Erebên Ednanî ne). Ev hevpeyman li dijî du komên din yên siyasî û dijber biserket:

**1- Koma Ensaran:** Ew ji rûniştivanên bajarê Medînê pêkdihat; ew bi kok û binyata xwe ji Erebên Qehtanî ne; yanê ji yên Yemenê ne. Di destpêkê da hinekan ji wan bi tundî xwest ku xîlafeta *Pêximber* ji wan be; ji ber ku digotin,

heger ne ji bo keda wan di şeran da û pejirandina *Muhacirên* ku ji Mekke bazdabûn, misilman bi ser nediketin.

**2- Koma Benî Haşim:** Ew ji êla *Pêximber Muhemmed* bûn; bi rêveberiya *Elî Bin Ebî Talib* (pismamê *Pêximber*), kebaniya wî *Fatîme* (keça *Pêximber*) û *Ebbas Bin Ebdulmutelib* (apê *Pêximber*). Van dixwest ku *Elî* bibe xelîfe, ji ber ku ji malê ye (mala *Pêximber*) û hem jî zavayê *Pêximbere*(1).

Lê belê bi pilanekî ji aliyê *Umer Bin El Xettab* da, *Ebo Bekir* bû *Xelîfeyê Yekem*. Wî jî - berî ku wexer bike - xîlafet sparte *Umer*. Piştî ku *Umer* hate kuştin, *Osman Bin Effan* bû xelîfe. Gava ew jî ji hêla dijberan va hate kuştin, êdî *Elî Bin Ebî Talib* bû xelîfe. Lê belê pir *Sehabî* li dijî wî rawestiyan. Yê herî navdar di nav wan da, dijminê wî, *Muawiye Bin Ebî Sufyan* bû. Ew li bajarê Şamê li dijî *Elî* derket ku hên di dema *Osman* da bûbû waliyê vî bajarî. Wî xelîfe *Elî* sûcdar kir ku destê wî di kuştina *Osman* da heye. Bi vî awayî *Muawiye* li Şamê doza xilafetê kir. Di navbera van herdu aliyan da şerên giran derketin ku bi dehhezaran kes têda hatin kuştin(2).

Gava *Elî* (*Xelîfeyê Çaremîn*) jî sala 40-ê goçî/661-ê z. hate kuştin, alîgirên wî kurê wî yê mezin *Hesen* wek xelîfe xwestin. Lê belê *Hesen* nikarîbû li hember dijberê xwe yê xurt *Muawiye* raweste; rabû di sala 41-ê goçî/661-ê z. bi wergirtina bihayekî bilind (pir diravan) xîlafet bi ser *Muawiye* da berda. *Muawiye* serdariyeka malbatî ya nû peydakir ku bi navê *Xîlafeta Umewî* hat naskirin û serdarî (xîlafet) kir malbatî (mîras). Di dema xelîfe *Yezîd* kurê *Muawiye* da, *Husên* kurê *Elî* li dijî wî serî hilda. Rabû tevî malbat û alîgirên xwe ji bajarê Mekke biderket û çû bajarê *El Kufe* li Îraqê ku ji wir rêveberiya serhildanê bike; ji ber ku piraniya alîgirên wî (*Şî'e*) ji rûniştivanên Îraqê bûn. Lê belê xelîfe *Yezîd* ferman da ku rê li wî bigirin û nehêlin ew bigihîne bajarê *El Kufe*. Ji hêla din va pir alîgirên wî yên *Şî'e* arîkariya wî nekirin. Bi vî awayî şerekî ne wekhev di navbera *Husên* û leşkerê *Yezîd* da li bajarê *Kerbelayê* pêkhat ku di wî şerî da *Husên* û gelek xizimên wî jî hatin kuştin(3).

## Dijberî û Keftelefta Haşimî - Umewî:

Bi vî awayî xîlafet di nav malbata *Umewî* da ma. Lê belê, ew *Şî'e* (alîgirên *Elî*) yên ku arîkariya *Husên* nekirin gelek li xwe poşman bûn û rabûn ji ber vê poşmaniyê bi zincîran li laşê xwe xistin. Ev kes bi navê *Tobedaran* tên naskirin. Êdî ev kes rabûn û li Îraqê dest bi serhildanan kirin û bi taybetî jî li dijî serdariya *Umewî*. Di navbera *Şî'e* û alîgirên *Benî Umeye* da, ku di pey ra bi navê (*Sunne*) hatin naskirin, pir şer û pevçûn pêkhatin û pir qurbanî hatin dayîn. Serekên *Şî'eyan* bi nehînî kurê *Elî* yê sêhem *Muhemmed* ku bi navê (*Muhemmed kurê Henîfe*, li gor dayîka wî ji êla *Benî Henîfe*) tê naskirin wek rêber ji xwe ra hilbijartin. *Şî'e* di van şeran da bi ser neketin û wan gelek wendayiyên giyanî dan(4).

Piştî wexerkirina *Muhemmed* kurê *Elî*, êdî kurê wî *Ebo Haşim* (*Ebdella*) wek *Îmam* hate hilbijartin. Ji ber pirbûna hejmara kuştiyan di nav rêzên *Şî'eyan* da, ev dijberiya *Şî'eyî,* ji awayê şerê leşkerî yê rû bi rû derbas şêweyê xebata siyasî ya nehînî bû. *Ebo Haşim* alîgirên xwe bi awayekî rêxistinî, bi rêk û pêk

organîze kirin. Wek awayê rêxistinên nûjen yên vê demê, tiştekî wek *Komîteya Navendî* avakir. Endamên wê komîteyê bi navê (*El Duhat*) (الدُّعاة) dihatin naskirin. Her endamek ji wan berpirsyarê beşê rêxistinê yê nehînî li her welatekî bû û dest bi karê propaganda dijî serdariya *Umewî* dikir, alîgir peyda dikirin, ew organîze dikirin û pereyên endametiyê (*El Xums*) (الخُمْس) dicivandin û ji bo *Îmam (Ebo Haşim)* dişandin ku li bajarê *El Taêf* (li başûrê Mekke) dima. Ev hemû xebat bi awayekî pir nehînî birêve diçû[(5)].

Di sala 98-ê goçî/716-ê z. da xelîfeyê *Umewî Suleyman Bin Ebdulmelik Îmamê Şî'e Ebo Haşim* bi mêvandarî vexwende Şamê; nirxekî bilind da wî û dostaniyeka hêja şanî wî da. Lê belê ferman da ku di rêya vegera Hicazê da jehrê bidin wî. *Ebo Haşim* dît ku mirina wî êdî nêzîk bûye. Li gor hin zanyarên dîrokî, vê carê di nav malbata *Elewî* da kesekî hêja tine bû ku bikaribe tevgera Şî'etiyê bi rêk û pêk pêşva bibe. *Ebo Haşim* li ser rêya Hîcazê bû mêvanê *Muhemmed Bin Elî Bin Ebdella Bin Ebbas* (Ebbas - apê *Pêximber Muhemmed*). Ev *Muhemmed Bin Elî* li gundê *El Humeyme* (الحُمَيْمَة) (Urdina niha) rûniştibû. *Ebo Haşim Îmametî* sparte wî û ji wî xwest ku rêveberiya tevgera *Şî'etiyê* bike û xebatê bike ku xîlafetê ji malbata *Umewî* bistîne[(6)].

Divêt em bêjin ku piraniya serekên malbata *Ebbasî* xwe ji dijberiya *Elewî-Umewî* bi dûr dixistin û peywendiya wan bi xelîfeyên *Umewiyan* ra baş bû; û xelîfeyê *Umewî* bû, yê ku gundê *El Humeyme* dabû *Elî Bin Ebdella Bin Ebbas*; gelek dirav jî dabûn wî û wisa *Elî* li wî gundî ji xwe ra qesrek avakiribû û hemû xizimên wî jî hatibûn ba wî. *Ebbasî* di rêvebirina tevgera *Şî'etiyê* ya nehînî da ji pismamên xwe yên *Elewî* gelek konetir û zanatir bûn. *Muhemmed Bin Elî* bajarê *El Kufe* kir navenda peywendiyê di navbera xwe û alîgirên xwe da li Xurasanê, li cihê herî rojhilat yê dewleta xîlafeta *Umewî*[(7)].

Endamên "*Komîteya Navendî*" ku wek "*Duat*" û "*Nuqeba*" dihatin binavkirin bi cilên bazirganan di welatan ra derbas dibûn; wan xwe wisa dida xuyakirin ku ew xerîkî karê bazirganiyê ne. Wan bi rêya endamê rêveber li *El Kufe* peywendî bi *Îmam* ra li *El Humeyme* dikrin, pereyên endametiyê *(El Xums*) digihandin wî û ferman ji wî werdigirtin. Wan sal bi sal dema çûndina Hecê ji bo van armancên xwe bikar dihanî. *Îmam Muhemmed Bin Elî* gelek haydar bû ku kesek navê wî û kesayetiya wî ya rast nizanibe, ji bilî yên here nêzîk ji wî va. Wî ev tevger bi navekî ne diyar, bi navê "*El Rida ji nifşê Muhemmed*" belav kir. Yanê bi navê kesekî ji malbata *Pêximber Mihemmed* ku mercên xîlafetê têda hene. Ev nav bi razîbûna serekên malbata *Elewî* bû û alîgirên wan jî pê razî bûn. Ji lewra, van hemiyan bi fedakarî û awayekî durist di vê tevgerê da xebat dikir, bi baweriya ku xîlafet wê ji kesekî ji nifşê *Îmam Elî Bin Ebî Talib* ra be[(8)].

Di sala 125-ê goçî/742-ê z. da *Îmam Muhemmed Bin Elî yê Ebbasî* wexer kir û Îmametî di pey xwe ra da kurê xwe *Îbrahîm*. Di dema *Îbrahîm* da û bi temamî di sala 127-ê goçî da ev tevger ji serdema nehînî derket û êdî ket serdema aşkere. Di vê serdemê da xortekî Kurd, dilêr û leheng, peywendî bi *Îmam Îbrahîmê Ebbasî* ra danî. Ev xortê Kurd kesayetiyeka rêveber û nasdar

bû. *Îmam Îbrahîm* ji wî xwest ku li Xurasanê rêveberiya şoreşê li dijî *Umewiyan* bike. Ev xortê Kurd *Ebo Muslimê Xurasanî* ye[9].

Gelo *Ebo Muslim* kî ye? Û rola xebata wî di hilweşandina xîlafeta *Umewî* da çi ye? Evê bibe mijara xeleka me ya dahatî.

**Jêder**

---

[1]El Tabari, Dîroka El Tabari, 3/203 -205, Ibin El Esir: El Kamel fi El Tarix, 2/191.

[2] El Tabari, Dîroka El Tabari, 4/563 - 5/64. Ebo Henîfe El Dîneweri̇̂: El Exbar El Tiwal, rûpel 155 - 179.

[3] Ibin El Esir: El Kamel fi El Tarix, 3/157 - 185. Ebo Henîfe El Dînewerî: El Exbar El Tiwal, rûpel 251 - 259.

[4] Ibin El Esir: El Kamel fi El Tarix, 3/261 - 311. Ebo Henîfe El Dînewerî: El Exbar El Tiwal, rûpel 290 - 301.

[5] Ibin Tebateba: El Fexrî fî El Adab El Sultaniye, rûpel 141.

[6] El Tabari, Dîroka El Tabari, 11/645. Hesen Ibrahîm Hesen, Dîroka Îslametiyê, 2/ 10 - 11.

[7] Ibin El Esir: El Kamel fi El Tarix, 4/108.

[8] Hesen Ibrahîm Hesen, Dîroka Îslametiyê, 2/12 - 13.

[9] Hesen Ibrahîm Hesen, Dîroka Îslametiyê, 2/15.